

PAPER DETAILS

TITLE: Hûrnêrînek li Ser Naveroka Heyranokên Herêma Wanê

AUTHORS: Mehmet YILDIRIMÇAKAR

PAGES: 61-72

ORIGINAL PDF URL: <https://dergipark.org.tr/tr/download/article-file/1500347>

Hûrnêrînek li Ser Naveroka Heyranokên Herêma Wanê*

An Overview of the Content of the Heyranoks of Van Region

Mehmet Yıldırımçakar**

PUXTE:

“Heyranok” yek ji cureyên edebiyata Kurdî ya gelêrî ye. Di nav keresteyên edebiyata Kurdî ya gelêrî de *heyranok* li gorî taybetiyên xwe yê xweser hêjayî gelek vekolîn û analîzan in. Ev xebat li ser naveroka *heyranokên* li herêma Wanê hatine berhevkirin hûr dibe û hewl dide ku van *heyranokan* ji hêla naverokê ve analîz bike û mijar, tema, hêma, motîf û sembolên wan destnîşan bike. Di serî de qala unsurên naverokê hatin kirin. Paşê, *heyranok* di çarçoveyê zanistî de, li gorî rêbazên zanista folklorê ji hêla naverokê ve hatin analîzkirin. Di encamê de hat dîtin ku mijara *heyranokan* evîn û evîndarî ye. Temaya bingeîn ku di naveroka *heyranokan* de derdikeve pêş evîn e û temayên xerîbî û mirinê jî di nav risteyên *heyranokan* de cî digirin. Û heyranok ji hêla hêma, motîf û sembolan ve jî gelekî dewlemend in.

Bêjeyên Sereke: Folklor, edebiyata Kurdî ya gelerî, heyranok, naveroka heyranokan.

ABSTRACT:

“Heyranok” is one of the genres of Kurdish folk literature. Among the genres of Kurdish folk literature, *heyranoks* deserve much research and analysis for their inherent characteristics. This work focuses on the content of the *heyranoks* collected in the Van region and tries to identify and analyze the subjects, themes, images, motifs, and symbols of these *heyranoks*. We wrote about content elements in the beginning. Then, the *heyranoks* were analyzed by the content in a scientific context,

* Ev gotar ji teza masterê der çûye ku ev tez bi nave “Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de Mînaka Herêma Wanê” pêşkêşî Zanîngeha Mûş Alparslanê, Enstîtûya Zanistên Cîvakî, Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî bûye.

** **Zanîngeha Çewlîgê (Bîngöl), Enstîtûya Zimanên Zindî, Beşa Ziman û Edebîyata Kurdî, Xwendekarê Doktorayê** / Bingöl University, Institute of Living Languages, The Department of Kurdish Language and Literature, Ph.D. Student. mehmetyildirimcakar@gmail.com
ORCID: 0000-0003-3565-1156

according to the ways and means of the science of folklore. As a result, it was found that the subject of *heyranoks* were love and affection. The main theme that emerges in the content of the *heyranoks* is love and themes such as alienation and death are also included in them. *Heyranok* is also very rich in images, motifs and symbols.

Key Words: Folklore, Kurdish folk literature, *heyranok*, content of *heyranoks*.

1. DESTPÊK

Berhemeke edebî ji du hêmanên sereke pêk tê; teşe û naverok. Teşe terza vegotinê, şeweya îfadekirinê ye. Rêzkirina bêjeyan, uslûb, avaniya metnê û hwd. unsûrên teşeya metnê ne. Herçî naverok e, wateya metnê yaxut berhemê ye. Tiştê tê vegotin, peyama tê dayîn, mijar, tema, hêma, motif û sembol unsûrên naveroka metnê ne. Naverok sîwana mijar, tema û wateyê ye.

Folklor, zanîna gel e û di heman demê de navê zanista ku bi “zanîna gel” ve mijûl dibe ye (Dorson, 2016, r. 9). Edebiyata gelêrî jî binbeşeke folklorê ye. Berhemên edebiyata gelêrî di nava jiyana rojane de, bi awayekî devkî, têne ristin û ji nîşan derbasî nîşan dibin. Helbesta gelêrî jî binbeşeke edebiyata gelêrî ye ku *heyranok* jî wekî cureyekê dikeve bin banê vê binbeşê.

“Heyranok cureyek ji helbesta gelêrî ye. Kurtehelbestên lîrik in. Vehonanên *heyranokan* ne diyar in loma *heyranok* malê gel in. Bi newayekê têne gotin. Aheng bi berma û vekêşan saz dibe. Di dema ciwaniya keç û xortan de hatine ristin. Mijara *heyranokan* evîn û evîndarî ye. Temaya bingehîn a *heyranokan* evîn e û temayên din jî bi evînê re têkilîdar hene. Her çiqas navê *heyranokê* li gorî herêman biguhere jî navê herî berbelav û tê zanîn dîsa *heyranok* e. *Heyranok* ne stran in lê xwediyê rîtmekê, newayekê ne. Dîsa ne cureyekî dûrîkan in. Ji hêla şiklî û naverokî ve cureyekî serbixwe ye. *Heyranok* ne berhemên edebiyata dengbêjiyê ne, berhemên edebiyata gelêrî ne” (Mehmet Yıldırımçakar, 2017b, r. 84).

Heyranok, beşek ji strana kurdî ya resen, pêkhatî ye. Tê de çend risteyên hozanan, sivik û tamxweş; bi kêş û vekêş hene. Straneke kurt, bi salîqe ye. Hemû bendên wê li ser evînê ne. Ji ber ku kurr û keç davêjine ber hev, tama evînê jê difûre û loma tama wê bi salan wekî xwe dimîne. Di vehanîna *heyranokê* de bêtir para keça kurd heye. Li *heyranokan* jî diyar e ku keça kurd xwediyê hesteke nazik, dilekî vekirî û evîneke paqij e. Digel vê kurê/lawê kurd jî *heyranok* gotine, keç û kuran *heyranok* bi saliqeyên sivik û xweş avêtine ber hev, ev *heyranok* hatine jiberkirin. *Heyranok*, stranên lîrik, her risteyekê hemî dîmen, wêneyên rengîn, nexşên nû û rengîn, hest û sozan bi rengekî berçav dike. Girêdana soz û peyman, dilsozî û rastgoyî derdixe pêş. *Heyranok* rengekî strana kurdî ya folklorî ye. Pirsoz û wefadarî, hejêkirineke paqij, digel xem û xweşiyê peyda dibe û xwe bi tîtal û rewşên bilind û paqij ve digel evîneke dijwar û dûr û tamsar girê dide. Selîqe *heyranokan* gelekî sivik in, ango em dikarin bibêjin bi awazeke taybet têne gotin.

Ger hest li ser xemeke pirêş û azar bin, awaz dê melûl be. Carinan jî evîndar bi awayekî xweşdivê, pesn û methkariyê ji berdilkê xwe re dibêjin. Vêga awaz diguhere, bi awazekî sivik, diltêrê tê gotin. Ji ber ku têkiliya kurdan bi neteweyên derdorê re çêbûye, peyvên biyanî jî ketine nava heyranokan. Heyranok hunereke berz û bilind e ku tu dikarî ji hêla komeleyetî, aborî, ramyarî, dîrok, ziman û hwd. ve miletî tê de bibînî (Amîdî, 2010: 9).

Ji ber ku heyranok jî berhemên çanda devkî ne, di vê dorhêla çandê de dizên, mezin dibin û ji nifşan bo nifşan vediguhêzin. Her kes li gorî dorhêla çanda xwe renekî dide vê cureyê, heyranokên her herêmê xwediyên taybetiyên xweser in. Loma kirina xebateke sehayî li herêma Wanê ku berî niha li ser berhevkerin, senifandin û dahûrîna heyranokan tu xebat nehatine kirin, girîng e.

Ev xebat dahûrînê li ser naveroka heyranokên li deverên cuda yên herêma Wanê, ji cih û kesên cûrbicûr hatiye berhevkerin, dike. Di deşîfrasyona dangan de devoka herêmê hatiye parastin, peyv û gotinên herêmê çawa hatibine gotin, rasterast, bêtî giherîn hatine nivîsîn.

Dahûrîna naveroka heyranokan û destnîşankirina tema, hêma, motîf û sembolên di naveroka heyranokan de derdikevin pêş du hîmên bingeîn in ku vê xebatê pala xwe dayê. Armanc ev e ku temaya evîn, xerîbî û mirinê û mezmûnên bi van temayan re têkilîdar bîne destnîşankirin, bi mînakên bîne pêşkêşkirin û şîrovekirin. Dîsa hêma, motîf û sembolên serekî bîne destnîşankirin.

2. TEMAYÊN HEYRANOKAN

Mijar, bînesaziya berhemên hunerî ye; tê şixulandin, şîrovekirin û watedarkirin. Mijar di berhema hunerî de şênber e û çarçoveya wê zêde berfireh nîne. Fîkr û raman, peyva û çîrokên ku hunermend bi paldayîna mijarê, bi bikaranîna unsûr û hûrgiliyên mijarê pêşkêş dike, temaya berhemê pêk tînin. Her berhemek temayeke xwe heye lê ji bo temaya berhemê derkeve meydana li ser fikirîn, dahûrîn, şîrovekirin, analîzkirin lazim e.

Herçî tema ye rihê berhemê ye: fîkr û boçûna bingeîn a ku di berhemê de serdest e, di berhemê de tê şixulandin, geşe pê dide temaya berhemê ye. Di helbestê de zêdetir hest û xeyal tîne şixulandin; ev hest û xeyalên ku bi awayekî tîr û zêde zêde derdikevin pêş, temaya helbestê pêk tînin. Her yekeya helbestê temayeke xwe heye û bi yekbûna van temayan, temaya bingeîn a helbestê derdikeve meydana. Ev temayên di nav helbestê de tîne şixulandin, têgeheke razber an jî ramanek e. Pîvana biserketina helbestê girêdayî awayê şixulandina temayê ye.

2.1. Temaya Evînê

Evîn li gorî bawerî û çandên cihêreng bi gelek awayên cuda cuda hatiye îdraqkirin. Li gorî Artun (2012, r. 77), “evîn, mijara herî zêde hatiye şixulandin e

di edebiyata gelêrî de. Evîndar bêbext in, emrê wan bi pey evîndaran derbas dibe. Evîndarên wan ne îlahî û îdeal in. Aşiq, bi bedewan re hevdîtinan dike, sozan dide wan û hetta dikare wana bi dest bixe. Ev edebiyat li ser evîn, têkiliya jin û mêrê, jevveqetîn, xurbet, xerîbiyê hatiye avakirin.”

Temaya evînê di edebiyata klasîk de temayeke bingeîn e û ev evîn, evîna îlahî û îdeal e. Di hunera dengbêjiyê de jî dîsa evîn temayeke sereke ye: Dengbêj di kilamên xwe de zêde zêde cî didine evîn û evîndariyê. Teswîrên evîndaran li gorî edebiyata klasîk diha rastîn in, lê wekî edebiyata klasîk qala bedewiya por, sûret, çav, birû, bejn û bal, dev û lêv, sing û beran tê vegotin di hunera dengbêjiyê de. Di edebiyata gelêrî ya tekke û medreseyan de ango ya tesewîfê de evîn, di navbera edebiyata klasîk û ya gelêrî de wekî pireyekî ye; evîn veguhêziye evîna îlahî û evîndar jî hewl daye ku ji evîna şênber xilas bibe di rêya peydakirina Xwedê de. Ango fikra Wehdetî Wucûdê heye. Di edebiyata gelêrî de temaya evînê temayeke bingeîn e, evîna beşerî hatiye bikaranîn û evîndar di nav arezûya xwegihana yarê/heyranê de ye. Ji ber ku heyranok yek ji cureyên helbesta gelêrî ye û dike-ve bin banê edebiyata gelêrî, di nav risteyên heyranokan de evîneke beşerî heye, evîndar hewl didin ku xwe bigînin heyranê.

Ji ber ku “heyranok li ser eşqê, evînê, pesnê yarê, delalî û spehîtiya wan e” (Sadînî, 2011, r. 9) ango evîn, avîndarî û tiştên bi evîndariyê re têkilîdar in dibine mijara heyranokan. Dema em li ser heyranokan hûr bibin em ê bibînin ku gelek temayên wan hene. Di heyranokan de temaya bingeîn evîn e.

2.1.1. Mezmûnên Evîndariyê

2.1.1.1. Ramûsan

Ramûsan di navbera du evîndaran de çêdibe, sembola hevşabûnê, gihêştinê ye. Di heyranokan de ev li gelek cihan derdikevin pêşberî me. Heyran ramûsanê wekî diyariyekê dibîne, dixwaze yara xwe ramûse. Hetta, ji ramûsanê re rêyekê dibîne ku ramûsana evîndaran ne guneh e.

Te keçikê zozaniyê

Tu keremke were ser kaniyê

Ez ê ramûsankî 'j te keremkim

Seva muhiba dila cînariyê (Koşmaz, 2013).

2.1.1.2. Gilî û Gazind

Dema kesek bi gotin an jî kirinên xwe dilê yekî bihêle, wî xemgîn bike, bixeyîdîne ev kesê ku dilê wî mayî, xemgîn bûyî yan jî xeyîdî bêtî ku hêrs bibe, gilî gazindan jê dike. Di nav risteyên heyranokan de hestên wekî gilî û gazindan gelek cihan derdikevin pêşberî me. Ev gilî û gazind, caran ji yara bêwefa, caran ji qedêrê, carînan ji dêwbavan tê kirin. Ev hest hemû ji ber negihêştina hev du ne.

Dema ji hev veqetin, dûrî hev bin, negihêjine hev, gilî û gazind dibine tercimanê hestên wan.

Tu kurapê min î kero
 Malê heft qirala, danzde dûwala xu da sero
 Te ne 'z xastim ne 'z revandim
 Te dame yekî xelkê xerîb li heft bavê me jî dero (Çalış, 2013).
 Tu qîzapa min kotiyê
 Berê berda min gotiyê
 Te yê digot ez ê nakim xubxutiyê (Çalış, 2013).

2.1.1.3. Keçrevandin

Ji bo evîn û hezkirin domdar û xurttir be hewla evîndaran ew e ku bi zewacê bigihê encamê. Carînan ji ber sedemên cur bi cur zewac bi derengî bikeve yan jî îmkana zewacê çênebe, evîndar serî li hinek rêyên cuda didin, yek ji wan rêyan jî keçrevandin e. Ango dema keç û xort ji hev hez bikin û ji bo zewaca wan astengî hebin, kurik keçikê direvîne. Di naveroka heyranokan de jî keçrevandin gelek caran derdikeve pêşberî me.

Min 'l vê taxê te 'l vê taxê
 Sûretsorê albûyaxê
 Were ez ê te 'brevînim bavêjim mala
 Îsmailê Temo, Behriyê Axê (Bala Yıldırımçakar, 2013).

Lo lo gede hîv derketiye hîva geş e
 Şewqê daye koşka bilind kaşmikaş e
 Gede hatye min 'brevîne
 Quzilqurta cencya wî nexaş e (Sayin, 2015).

2.1.1.4. Mirazê Bêdil

Di bingeha zewacên dûrî bextewarî û şadiyê de gelek sedemên cuda hebin jî sedema herî mezin mirazê bêdil e. Herçî sedemên mirazê bêdil e guherbar in; zordariya malbatê, rewşên aboriyê, cudahiyên çandî û civakî û hwd. dikarin bêne jimartin. Ev rastiya jiyanê rengê xwe daye hunerê jî. Di jiyana rastîn de her wiha di heyranokan de jî miraz, her car bi dilê mêriv çênabe. Ev yek wesîleya xemgîniyê ye. Mirazê bêdil dibe sedem bo gilî û gazindan. Gilî û gazind li sebebkar, şikyat ji vê rewşê tê kirin.

Hilma minê hilma mîhê
 Porê min şerîta dor keştiyê
 Xudê 'j dêwbavê min ra qebûl neke
 Serê min dane ser be'lgîkî xerîbiyê (Koşmaz, 2013).

Dilê'm sîka zinêr kevrê birrî
 Sînga subê lê da ya êvarê lê zivirî
 Xazya min ji wî'evdî hatî
 Bi çe've xu dîtî, bi dilê xu mêr kirî (Koşmaz, 2013).

2.1.1.5. Evîna Bêencam

Her evînek encameke xwe heye. Encama evînê her carê bi erênî nabe. Carînan evîndar nagihêjine hev du. Ev jî dibe sedema gilî û gazindan. Carîna yek ji evîndaran li ser soza xwe nasekine, carînan dêwbav nahêlin evîndar bigihêjin hev du. Evîn bi awayekî diçe badilhewa û dibe sedema dilsojî û xemginiyê.

Kuro gede pezê te hejiya
 Avêt gurz i çîmena, dor zeviya
 Gede par vî çaxî dilê min te dil bû
 Îsal vî çaxî bîna dîza denê wergeriya (Sayin, 2015).

Bêje te çe'verê heba tirî
 Min heft sala qirox kirî
 Salka heyşt xelkê ji me der hatî 'j xu ra birî (Yıldırım, 2013).

2.1.1.6. Mêvaniya Heyran

Di heyranokan de mijara mêvanbûna heyran gelek berbelav e. Xwesteka keçikê ew e ku şevêkê heyran bibe mêvanê wê. Dê gelek qedrê wî bigire, jê re beranekî serjê bike, dê sing û berê xwe pêşkêşî heyran bike. Lê dê van tiştan bi dizîka bike da ku dêwbavê keçikê nebihîzin.

Ez nexaş im were ser min
 Perrê orxanê bilindke'beve ber min
 Hekî dêwbavê min hatin gotin
 Ez ê bêjim Qasidê Qoca Felekê hatye ser min (Koşmaz, 2013).

2.1.1.7. Soza Evîndaran

Ger evîn hebe, teqez soz û qirar jî hene. Evîndaran soz dane hev du da ku ji bo eşqa xwe dilsoz bin, ji bo bigihêjin hev du têbikoşin, çi ji destê wan were, bikin. Di nav risteyên heyranokan de ev mijar gelek cihan de derdikeve pêşberî me. Sozê evîndaran rasterast di risteyan de cihê xwe digirin. Soza evîndaran ewqas mezin e ku heta دنیا xirabe jî ne xema wan e. Şûna peyva sozê peyva ehd û qirar, qewl û qirar jî tene bikaranîn.

Min got dengê min dengizê
 Ketye koka şîrê şîrhelizê
 Ez ê terka qemera xu nakim
 Heta Madî rabe, kantir bizê (Koşmaz, 2013).

Te qemerê tev kutayê
Zêrxizemê poz hildayê
Ez ê terka qemera xu nakim
Heta dergûş negre pêşê nebê dayê (Çalış, 2013).

2.1.1.8. Sekna Keçê

Di heyranokan de taybetiyeke jina kurd derdikeve pêş. Ew jî sekna wê ye. Keçik ji bo evîna xwe sekneke xwebawer nîşan didin. Keçik li pişt evîna xwe di-sekine. Şert ew e ku dilê wê gotiye. Kê çi bibêje bêfeyde ye. Xwedî li evîna xwe derdikeve.

Kuro gede Kurhesinî
Tu hem gul î hem sosin î
Dinya 'alem bibêje jî
Tu serdilka dilê min î (Hüsna Yıldırımçakar, 2013).

2.1.1.9. Xatirxwestina Evîndaran

Çawa bihevrebûna evîndaran sedema şabûnê ye her wisa jevveqetînan wan jî sedema êş û eleman e. Bi gelemperî jî vegera zozanan dema jevdûrmanê ye. Evîndar bêtî dilê xwe, xatirê xwe li hev dixwazin. Ev di risteyên heyranokan de gelek caran derdikevin pêşberî me.

Vê tirînê hereket kir
Vê wêranê hereket kir
Xu avête Şam û Heleb, Diyarbekir
Kuro gede tu yî çûyî, te birîna dilê min teze kir (Koşmaz, 2013).

Gede duh li vir bû îro 'l vir çû
Bi meşa quling, xema gur çû
Min nizanî meraqlî bû 'j derdê dil çû (Hüsna Yıldırımçakar, 2015).

2.1.1.10. Evîna Qedexe

Carîna jinên bimêr an jî mêrên bijin an yê zewicî dikevî nav evîneke qedexe. Vê yekê rengê xwe daye heyranokan jî. Di heyranokan de ev mijar gelek caran derdikeve pêşberî me. Lê ev wekî astengiyekê derdikeve pêş. Ji ber ku yar zewicî ye, gihêştin ne gengaz e.

Te qemerê fena çira
Xazî mêrê te bimira
Min ê helalîka Xudê
Tu 'l vî canî helal kira (Çalış, 2013).

2.1.1.11. Astengî

Di heyranokan de navbera evîndaran de pirrî caran astengî çêdibin. Astengî bi çiya, mij û moran, behrê hatine simbolîzekirin. Çiya, mij û moran, behr nahêlin evîndar bigihêjin hev du. Lê di rastiyê de astengî ne çiya ne, ne mij û moran, ne jî behr e. Astengî bi van tiştan hatine veşartin. Dibe ku çînên civakî bin, dibe ku yek zewicî be a/ê din ezeb, dibe ku malbat dijmînê hev du bin û hwd. Gilî gazind li van astengiyan têne kirin.

Keçê çiya bilind e te nabînim
Ez ê serê gulisosina naqetînim
Tu desmala xwe bavêje ez ê hilînim
Pê xemixiyalên dilê xu 'brevînim (Hüsna Yıldırımçakar, 2015).

Çiya bilind e te nabînim
Xewê şeva te dibînim
Sibê şeveqê radibim te nabînim
Kor im, posîde me, direwîn im (Narinç Özbek, 2013).

2.1.1.12. Nexweşiya Yare

Di heyranokan de gelek caran jî evîndaran yek nexweş dikeve. Ev nexweşî ne nexweşiyeke şênber e, ev nexweşî, nexweşiya dilî ye. Xetereyeke mezin e. Nexweş dê jî ber derdê dilî bimire û xwesteka wî ya dawîn jî ew e ku berî mirinê bi çave serê xwe heyranê xwe bibîne.

Ez nexaş im pirr helak im
Hûnê gazî lawkê 'm taxa han kin
Hekî hatye jixu hatye
Hekî nehatye bavê wî bikujin
Pezê bavê wî talan kin (Koşmaz, 2013).

Mîn dîwarê qermê reşo
Te dîwarê qermê reşo
Cihab hatye law nexaşo
Ez ê heram bikim hina desta, kilê reşo (Nurettin Özbek, 2013).

2.1.1.13. Hewî

Di nav civaka kurdan de zewaca dujinî heta çend salên pêş jî gelek berbelav bû. Em vê rewşê di nav heyranokan de jî dibînin. Mêr carînan li ser jina xwe re jineke din tînin. Di heyranokan de bi piranî, jina pêşîn gilî û gazindên xwe li mêrê xwe an jî li hewiya xwe dike.

Kuro gedê te ser min re girtî yar e
 Heke li min rintir e li te bimbarek
 Heke li min kotîtir e
 Kula Mûşê û Helebê
 Mala bavê te da rûnê salê carek (Koşmaz, 2013).

Kurko carek te carek
 Min wê bihîstî te girtî yarek
 Heke 'j min çêtir bît, te pîrozî bît û mubarek
 Heke 'j min çêtir nebît pêtevedet reşkoremarek (Nurettin Özbek, 2013).

2.1.1.14. Qelen

Di civaka kurdan de qelen standin heya demeke nêz jî berbelav bû. Bavê keçikê pereyekî giran pêş keçikê ve ji malbata zavê dixwaze. Ev yek caran dibe astengî, carinan jî keçik bi zehfê bûna buhayê qelenê xwe, xwe qure dikan, pê pesnê xwe didin.

Ez ê reş im biha nakim
 Ez ê herim ce qelaçî xu qelakim
 Ez ê qelenê çîla, çe'vresa, bedewa ser xu rakim (Çalış, 2013).

Çi 'ewrekî pirtîmirtî
 Donmardorê dinê girtî
 Heyla reşo 'j min reştiro
 Ez ê reş im biha nakim
 Ez ê herme cem qelaçî xwe qela kim
 Ez ê qelenê çîlan û rindan ser xwe rakim (Narinç Özbek, 2013).

2.1.1.15. Çarenûs ('Enînûs/Qeder)

Qeder û felek di heyranokan de gelek derdikevin pêşberî me. Evîn hebe, du encamên wê hene, yan erênî yan nerênî ye. Ger erênî be, cihê şanaziyê ye. Lê nerênî be, divê tiştek bibe sedem, ev jî feleka xayîn e. Di heyranokan de baweriyeke xurt li çarenûsê heye. Caran evîndar ji hev re dibêjin; Xwedê ez bo te nivîsîme, ew nivîs nayê jêbirin. Ger hatibe nivîsîn dê wisa jî bigihêje encamê.

Wele navê min Seher e
 Bille navê min Seher e
 Singê min defter e,
 Zimanê min qelem e,
 Tûka min hibr e
 Yazî muqeder e,
 Etîmo gedê navê te li ser e (Koşmaz, 2013).

Kanî hene li milê ne
Serê kanya binê kanya, bin melekê mewtê lê ne
Heçî tiştê tene serê mêriv
Hemû yazî muqederê di Xudê ne (Koşmaz, 2013).

2.2. Temaya Xerîbiyê

Di heyranokan de temayên bi evînê re têkilîdar, wekî xerîbî, hezkirin û berîkirinê jî pirr caran hatine bikaranîn. Di heyranokan de temaya xerîbiyê cihekî girîng digire. Di nav risteyan de ev tema gelek berbelav e. Evîndar jî hev dût in, di navbera wan de gelek asteng hene. Carînan yar çûye eskeriyê, carînan çûye xebatê. Carînan jî çiya û behr rê nadinê da ku bigihêjine hev du.

Kuro gede
Laçka serê 'm qîçik e
Zêrê hustuyê 'm çar niçik e
Wextê gedelawkê 'm li welatê xerîbyê tê
Tu divê beranekî heft gurçik e (Koşmaz, 2013).

Baqek gulê wan çirîşan
Ez ê têxme nav desmala nav hevirmîşa
Ez ê bişînme welatê xerîbyê
Nav eskera nav çawûşa (Sezer, 2016).

2.3. Temaya Mirinê

Di heyranokan de temaya mirinê jî heye. Mirin sembola negihêştinê ye. Mirin jî hev veqetînê çêtir e. Di dema saxiyê de qedirnezanîna yarê, bi mirinê re çê dibe. Evîndar dixwazin piştî mirinê jî evîna wan bidome.

Gede ez dimirim tu sebeb î
Bila turba min derê mala bavê te bî
Wextê ez ê mirim tu yê bêje
Wey miriyo rihme'î te bî (Koşmaz, 2013).

Ez dimirim roja î nê
Hûnê kevrê'm bînin li Selîmê
Hûnê gîhayê'm bînin Gîhadînê
Hûne ava'm bînin li Mêrdînê
Wextê ez ê mirim,
Hûn ê destê gedelawkê min bigrin bînin nava şînê (Koşmaz, 2013).

3. MOTÎFÊN HEYRANOKAN

Li Gorî Özarslan jî têgeha motîfê dubareyên qalibî ne. “Têgeha motîfê ku di vegêranan de domdariyê pêk tîne û wekî dubareyên qalibî derdikeve pêşberî me, di şeweyê yekeyên piştevaniyê yên di vegêranan de tevdeyiya tematîk saz dikin rû dide (2006, r. 88). “Edebiyata gelêrî jî çanda mitolojiyê ya bêbinî û dewlemend sûdê digire. Piraniya motif pala xwe didine Qur’anê, qisseyên pêxemberan, menqibeyên dînî, efsane û baweriyên gel. Lê piraniya wan wekî edebiyata klasîk jî avzema mîtolojiya îranî avê vedixwin. Ev motîf derbasî çanda milî bûne û di nav gel de berbelav bûne. Ev wekî mezmûn, xezîneyên motîfan derbasî edebiyata gelêrî bûne” (Artun, 2012, r. 77).

Motîf hêmanek e, fikrek e ku di berhemên hunerî de pir caran tê dubarekirin û temayê dîpat dike: Motîf unsûrên herî piçûk in ku di vegêranê de cudahiye saz dikin û wekî dubareyên qalibî tene bikaranîn di cureyên pala xwe didin vegotinê yên wekî çîrokên gelêrî, çîrvanok, fesaneyan de. Motîf avaniyên derbirînê ne; di berhemên cuda cuda de bi heman awayî tene bikaranîn û di hişê mirovan de mayînde dibin.

3.1. Cilûbergên Berê

Di heyranokan de bi her hêlê ve jiyana gel û motîfên wê serdest in. Di nava risteyan de li gelek cihan qala cilûbergên berê tê kirin. Peyvên wekî; dêre, fistan, kiras, xiftan û hwd. desbas dibin.

Dêre çîtê dêre kobe
Bes bigere obe obe
Kuro gede ‘j te ra şerm e
‘J mi ra tobe (Koşmaz, 2013).

3.2. Xizêma

Di heyranokan de xizêma yarê motîfek e, bedewbûna yarê îfade dike. Gelek caran kurik bi xizêma yarê pesnê yarê dide, carinan keçik pesnê xwe û xizêma xwe dide. Heta caran jî bo xizêma yarê mêr jî tene kuştin.

Kuro gede neçe Wanê Wan dudu ne
Serê rêya Wanê mêr kuştine
Seva xizêma pozê min e (Koşmaz, 2013).

Te qemerê tev kutayê
Zêrxizêma poz hildayê
Ez ê terka qemera xu nakim
Heta dergûş negre pêşê nebê dayê (Çalış, 2013).

3.3. Motîfên Kevnare

Ji ber ku heyranok berhemên folklorîk in, ‘urf, ‘edet û kevneşopiyên civakê nîşan didin. Di nav risteyên heyranokan de gelek motîfên kevnare yên wekî, kon, çî, xiftan, teşî, dîza denê û hwd. derdikevin pêş.

Kuro gedde pezê te hejiya
Avêt gurz i çîmena, dor zeviya
Gedde par vî çaxî dilê min te dil bû
Îsal vî çaxî bîna dîza denê wergeriya (Sayin, 2015).

Dêre çîte dêre kobe
Bes bigere obe obe
Kuro gedde ‘j te ra şerm e
‘J mi ra tobe (Koşmaz, 2013).

3.4. Hesp

Di heyranokan de motîfeke sereke jî hesp e. Her kes nikare bibe siyarê hespa boz. Encax heyran dikare lê siyar be. Ev sedemê pesnê ye. Kurik li hespê siyar dibin û keçik li bejn û bala wan dinêrin. Keçik ne tenê pesnê yarê dikin, pesnê hespa yarê jî dikin.

Siyarê bozê boz birçî kir
Şara serê ‘m çar qamçî kir
Kuro gedde te yê seva derdê dilê rezîl
Her çar malê Kosa ricaçî kir (Koşmaz, 2013).

Tu kurapo kurê apê
Tu siyar nebe hêşîn bozê, dêl ser kopê
Hêwyê neyne ser qîzapê (Koşmaz, 2013).

3.5. Şivan

Di heyranokan de motîfa şivan gelek cihan derbas dibe. Yar şivan e, li bilûrê dixê, diçe ber neh-deh semerr pez. Şivantî tişteki baş e. Keçik bi şivantiya yarê şanaz e. Bi vî awayî pesnê yarê dide.

Gedelawkê min şivanê hûrkavira
Kavir kirin danzde birra
Hûn Xudê kin hûn ê gedelawkê min nekin tu nîfira
Gedelawkê min piçûk e çaxê min ra (Hüsna Yıldırımçakar, 2013).

Te şivano çerxa xêvo
Pez kişyaye ser delêvo

Heyfa minê nayê li wê heyfê
 Heyfa minê tê li vê heyfê
 Tuncka sor e sortarî
 Derketye ser xuckê kulê birî (Sayin, 2015).
 Pezê nîvro hate dana
 Nêrya pêkutaye ser şivana
 Min go ez kurbana tilîpêçkê bilûrvana (Bala Yıldırımçakar, 2013).

3.6. Pale

Di heyranokan de motîfa pale jî gelek berbelav e. Keçik bi paletiya yarê dilşad e, bi vî awayî pesnê wî dide. Paletî nîşana jêhatîbûnê ye. Serhonaz jî serokê pala ye û paleyê herî jêhatî ye.

Mêrga mala bavê min mezin e
 Pala girtye serobin e
 Serhonazî lawkê min e (Koşmaz, 2013).

Çi palekî li vê navê
 Reş qimitî li ber tavê
 Xazî ez ê bibama kevokekî reşitarî
 Biketama vê hindavê (Yıldırım, 2013).

3.7. Çûna Leşkeriyê

Çûna yarê bo leşkeriyê bûye mijara gelek heyranokan. Çûna lêşkeriyê jevdûrketina evîndaran e. Leşkerî astengek e di navbera evîndaran de. Ne tenê bo keçikê her wiha ji bo dêwbavê kurik jî wesîleya xemginiyê ye.

Wey eskero wey eskero
 Dê 'b axîno bav'b kesero
 Heke hûn gedelawkê min naznakîn
 Ew eskerê kincê wî zero (Koşmaz, 2013).

Tu eskero tayînbiro
 Min sê denga gazî kiro
 Min nizanbû dilê esker
 Hê li dilê min kultiro (Yıldırım, 2013).

4. SEMBOLÊN HEYRANOKAN

Sembol şêweya hest, fikr, xeyal û sêwiranên mirovan ya ku di nava gotin, nivîs an jî wêneyê de cîwar bûye ye. Bi wî awayî şifre û kodên xweserî çandê dihewînin. Dorhêla çandê; unsûrên dîrokî, coxrafî, dînî, civakî û hwd. şikl û wateyekî didine van şifre û kodan.

Sembol bireserek e ku tiştêkî dîtir temsîl dike an ku ji bo wê tiştê tê bikaranîn; bi gelemperî tiştêkî kûrtir û girîngtir temsîl dike wekî amblem an jî işaretekî. Di berhemên edebî de zêde nayêne pêşberî me yek yan jî du-sê caran tene bikaranîn. Sembol ew hêman in ku di nav dorhêleke çandî de tene afirandin û unsûrên girîng yê çandê ne.

4.1. Tirên

Di heyranokan de gelek caran em rastî peyva tirênê tên. Tirên sembolek e; caran temsîla jihevveqetînê ye carinan temsîla gihîştinê ye. Tirên yarê hildide dibe cihekî dûr, hestên xerîbiyê nîşan dide.

Vê tirînê hereket kir
Vê wêranê hereket kir
Xwe avête Şam û Heleb, Diyarbekir
Kuro gede tu yî çuyî, te birîna dilê min teze kir (Koşmaz, 2013).

Tirên hato minare kir
Lawê borî min nas nekir
Heyla 'l minê min rebenê
Tirên hato 'l alyê xetê
Bihar e eskerê xelkê hato bi xêr û şahî
Eskerê min'evdala xudê hatî bi dilmayî (Narinç Özbek, 2013).

4.2. Xwesî

Di heyranokan de fîgûrên bûk û xwesiyê gelek derdikevin pêşberî me. Têkiliya bûk û xwesiyê heye û ev têkilî caran têkiliyeke nebaş e, bûk li xwesiyê nexweşhal e. Lê car caran jî bûk ji xwesiya xwe hez dike. Xwesî, ji ber ku dayîka hayran e, qîmetdar e.

Ez heliyam bûme şima
Heval i hogirê dora min, ker bûn negotin şima
Derdê mêrê kotî, xasya tima (Koşmaz, 2013).

Kuro tu nebêje dayka mi ra metê
Kuro gede dayka 'm dewsa xasya te tê
Kuro 'j mi ra 'eyb e
'J te ra çiqas bêjî gune jê tê (Koşmaz, 2013).

4.3. Hîv

Dîsa gelek heyranok li ser hîvê hatine honandin. Hîv ronahiyê temsîl dike, sembola ronahiyê ye. Çawa hîv tariya şevê bela dike, her wiha tarîti û gelo/gumanên di navbera evîndaran de jî ronî dike.

Hîv derketîye hîva zer e
Minê pêşa mêzera xu da ber e
Heçyê orta her du dila, her çar çava da pîs xeberde
Ew ne 'l ometa Pêxember e (Hüsna Yıldırımçakar, 2013).

Hîv derketîye hîva sava
Hîv xeyîdye naçe ava
Xazî îman i Qur'anê
Gedelawkê mi'l ser sing i berê 'm biba zava (Hüsna Yıldırımçakar, 2015).

Lo lo gede hîv derketîye hîva geş e
Şewqê daye koşka bilind kaşmikaş e
Gede hatye min 'brevîne
Quzilqurta cencya wî nexaş e (Sayin, 2015).

4.4. Çûna Ser Kaniyê

Çûna keçikê ya ser kaniyê sembola hevdişînê ye. Di jiyana rojane ya gundan de li nava gund kaniyek heye û keçikê gund diçin li kaniyê avê tînin û keç û xort bi saya vê yekê hev du nas dikin, hev dibînin û dilê wan dikeve hev du. Ger bixwazin hev bibînin çûna ser kaniyê dibe behaneyekî. Ev simbol di nav risteyên heyranokan de gelek berbelav e.

Sibe ye sura sibê bêna bê tê
Kanî dûr e muhiba dilê 'm li avê tê
Bejna zirav, kembera zîvîn, qolê zêra çawa lê tê (Koşmaz, 2013).

Te keçikê zozanîyê
Tu keremke were ser kanîyê
Ez ê ramûsankî 'j te keremkim
Seva muhiba dila cînarîyê (Koşmaz, 2013).

5. HIN MIJAR Û HÊMAYÊN DIN

Unsûra herî berbiçav a ku zimanê helbestê ji yê rojane vedîqetîn hêma ye. "Hêma, xeyal û tiştê ku di hişê mirov de tê teswîrkirin û mirov dixwaze/hêvî dike pêk were ye" (URL-1). Hêma teswîrên di dunyaya xeyalî ya şa'ir de hatine çêkirin in. Hêma ji adetê der in ango derasayî ne û hewce ye resen/xwemalî bin. Dibe ku ji bêjeyekî yan jî ji zêdetir bêjeyan pêk bên.

5.1. Nîfir û Lava

Nîfir û lava çanda mîletî ya daringî û arîşen, bawerî û nîrxên civakê dide pêş. Di heyranokan de nîfir û lava gelek caran derdikevine pêşberî me. Nîfir, caran

ji kesên di navbera evîndaran de ‘ewaniyê/fesadiyê dikan, caran ji yara bêbext û bêsoz û carînan jî nifir ji bilî yarê li her kesî tene kirin.

Şemşedîna di korê da
Sîwsê malê di dorê da
Qir bikevê kul bikevê
Xêncî mala yara ‘m tê da (Koşmaz, 2013).

Kanya gundê me lûle ye
Ser da bin da makîne ye
Heçî ara min û gewra min da xeber bide
Xêrê nebîne ‘j bedena xwe ye (Yıldırım, 2013).

5.2. Siruşt

Di heyranokan de di gelek ciyan de qala bedewbûn û xweşikbûna siruştê tê kirin, bi hezkirin û berîkirina yarê re, ya siruştê jî derdikeve pêş. Di mehên biharê de xweşikiya çiya, deşt, zozan û hewayê, di zivistanê jî barîna berfê, girtina mij û moranê li dora çiyayan, bilindbûna çiyayan û li hemberî van bûyeran, bêçaretîya evîndaran tê vegotin. Di navbera van de manendin tê saz kirin. Bi kurtî rêgezên siruştê bi hêlên xwe yên erênî û nerênî ji bo pêşkêşkirina evîn, xerîbî, hezkirin û bêrîkirinê dibin arîkar û roleke eslî hildidin.

Di heyranokan de rêgezên siruştî gelek berbelav in. Peyvên wekî: Çiya, çem, kanî, mêrg, zozan, zevî, gurz, delav, guher, çîmen, kevir, zinar, gelî, bîr, bihar, zivistan, şev, roj, sube, hîv, stêrka subê, çavkanî, sî, rewnaq, şewq, ‘ewr, hindav, cew, aş, kor, kendal û hwd. di nav risteyên heyranokan de derdikevin pêşberî me.

Şewityê gundê me Pîrkal e
Xopanê gundê me Pîrkal e
Binî da cewê aşan in
Hustu da korikendal in
Gulsosina li ser hev da nalenal in (Koşmaz, 2013).

Lo êtîmo min sond xarye ez ê naçim çiya
Naçînim gulan i sosinên çe’vkanîya
Carekî dilê bêdil mutesel bû ez helîyam (Sayin, 2015).

5.3. ‘Erdnîgarî

Di heyranokan de qala ‘erdnigariya deverê tê kirin. Navên gelek çiya, gund û bajar, çem, zozan û hwd. derbas dibin. Di heyranokên ku me li qadê berhev kirî de gelek navên ‘erdnigariya Kurdistanê yên wekî: Behra Wanê, Artemêrt, Suphangol, Axlece, Çemê Payê, Çemê Kurrê, Selîm, Gîhadîn, Mêrdîn, Mûş, Heleb, Rihan, Pîrkal, Seydîbeg, Qerecix, Şemşedîn, Şam, Diyarbekir, Wan û hwd. derbas dibin.

Vê tirînê hereket kir
 Vê wêranê hereket kir
 Xu avête Şam i Heleb, Diyarbekir
 Kuro gedê tu yî çûyî, te birîna dilê min teze kir (Koşmaz, 2013).

5.4. Xwezî

Peyva xwezî, tê serê hevokên daxwazê îfade dikin. Tê wateya; daxwaza min ev e ku. Di heyranokan de ev hest gelek berbelav e. Di gelek risteyên heyranokan de derdikeve pêşberî me.

Çemo çemo çemê Payê
 Çem dikişê bîna bayê
 Xazî yekî mizginîke xêrê bida min da
 Bigota Gulê bûye bûka Husnayê (Hüsna Yıldırımçakar, 2013).

Bejna gewra min zirav e tê gotinê
 Xazî bihata ber bazarê firotinê
 Xelkê bida malûhalê dinê
 Minê bida rihê şirînê ber mirinê (Sayin, 2015).

5.5. Erotîzm

Erotîzm di heyranokan de gelek tê bikaranîn. Lê erotîzm bi piranî li ser sing û bera ava dibe. Carînan keçik bi bedewbûna sing û berê xwe pesnê xweşikbûna xwe dide. Carînan dixwaze sing û berê xwe pêşkêşî yarê bike. Sing û ber, gihêştina hev du îfade dike, encama evînê ye.

Wele navê min Nîgar e
 Bile navê min Nîgar e
 Sing i berê min kanîka avasar e
 Mêrkê Mûskî sala îsal, mi ra derket bêitbar e (Sayin, 2015).

Kuro gedê neçe Wanê tê Wanî bî
 Avê gola nexwe tê genîbî
 Tu yê were ser sing i berê min razê
 Tê cinetî bî (Koşmaz, 2013).

5.6. Flora

Navên dar û ber û gihayan di nav risteyên heyranokan de gelek tên bikaranîn. Ji bo pesnê yarê bê dayîn, gelek caran dibine alavekê. Navên wekî: Reyhan, gul, sosin, çiçek, kurdîrê bejî, sêv, dartûyîn, piltan, tirî û hwd. derbas dibin. Bejna yarê wekî darekê an tayeke reyhanê, çavê yarê wekî hebê tiriye ne. Porê yarê bêhna gul û sosinan dide. Bi hunerên edebî re têkilî tê sazîkirin.

Gede dilê 'm bejna te dirêj e
 Bîna takreyhana devê gelya şewq davêjê
 Kuro gede bira dilê min te 'b dil be
 Bira gundî cînar 'j xu ra bêje (Bala Yıldırımçakar, 2013).

5.7. Faûna

Di nava heyranokan de navê ajelan jî gelek caran derbas dibin. Peyvên wekî; kevok, quling, pez, kavir, nêrî, bizin, mîh, qantir, gur, tîremar, teyr, teyrê serberatî, teyrtawus, cehnî, boz, bergîr, dîk, minminîk û hwd. Ev her yek xwediyê taybetiyekê ne. Bêxemiya yarê wekî bêxemiya gur e, bedewiya wê wekî teyrê tawus e, desmala yarê wekî perê minminîkê tenik e.

Pezê nîvro hate dana
 Nêrya pêkutaye ser şivana
 Min got ez kurbana tilîpêşkê bilûrvana (Bala Yıldırımçakar, 2013).

Min go Qerecixê dengê dîka
 Şemşedînê li firîka
 Desmala ser destê gedelawkê min wusan e
 Notila perrê minminîka (Koşmaz, 2013).

5.8. Çînên Civakê

Dema em heyranokan vedikolin wekî hemû berhemên edebiyata gelêrî, peyamên civakî dide me. Jiyana rojane, rewşa civakê rût û tazî li ber çavan e. Çawa di civaka rastîn de zengîn - kasib, mîr - xulam û hwd. hene, di nava heyranokan de jî ev tev hene. Çînên civakê, asta di navbera kesên civakê de, bi awayekî êşkere rû didin.

Çemê Kurrê lemelem e
 Kevrê ortê çarkelem e
 Kurê kerê durî 'm here
 Ez ne sêva devê te me (Bala Yıldırımçakar, 2013).

5.9. Navên Şexsan

Dîsa di heyranokan de gelek navên taybet hatine bikaranîn. Dema heyranok ji kesan bo kesan veguhêzîne, navên di nav heyranokan de ji hêla wan kesan ve hatine guherîn û li gorî rewşa xwe nav hatine bikaranîn.

Wele navê min Seher e
 Bille navê min Seher e
 Singê min defter e,

Zimanê min qelem e,
 Tûka min hibr e
 Yazî muqeder e,
 Êtîmo gede navê te li ser e (Koşmaz, 2013).

5.10. Dijûn

Di heyranokan de dema keçik an xort ji hev hêrs dibin, ji hev re dijûnan dibêjin, ev yek di gelek heyranokan de tê dîtin.

Çemê Kurrê lemelem e
 Kevrê ortê çarkelem e
 Kurê kerê durî 'm here
 Ez ne sêva devê te me (Bala Yıldırımçakar, 2013).

5.11. Sond

Di heyranokan de sond jî gelek ciyan derdikevin pêş. Evîndar kesane didine sondê da ku tiştên nebaş nebêjine yarê, nifiran li yarê nekin.

Gedelawkê min şivanê hûrkavira
 Kavir kirin danzde birra
 Hûn Xudê kin hûn ê gedelawkê min nekin tu nifira
 Gedelawkê min piçûk e çaxê min ra (Hüsna Yıldırımçakar, 2013).

Çûme Enqera şewitî qûma şîn e
 Hemû usteymen in yuzbaşî ne
 Hûn Xudê kin hûn ê gedelawkê min nexin, neêşîn
 Gedelawkê min nazik e, nazenîn e. (Bala Yıldırımçakar, 2013).

5.12. Pesin

Meth û pesin di gelek heyranokan de derdikevin pêşberî me. Ji ber ku mijara heyranokan evîn û evîndarî ye, evîndar bi her hêlê ve hem pesnê xwe didin hem jî pesnê heyranê didin. Pesnê yarê bi gelek hêlan ve tê dayîn. Caran behsa bedewbûnê, rindbûna bejnûbalê, çav û biriya tê kirin, carinan jî behsa jêhatîbûnê heye.

Ez ê teyr im teyrtawis im
 Li zozana li çîmena dilemisim
 Ez ê ser ra qurs im, bin ra dîteyîsim (Koşmaz, 2013).

6. ENCAM

Heyranok kurtehelbestên lîrik in, li ser evîn û evîndariyê hatine ristîn. Dema em ji hêla naverokê ve heyranokê analîz bikin divê em bala xwe bidin unsûrên

naverokê pêk tînin. Unsûrên naverokê mijar, tema û wate ne û di heman demê de hêma, motîf û sembol jî dikevin bin banê naverokê.

Di encama lêkolînê de hat dîtin ku mijara heyranokan evîn û evîndarî ye û ev evîn, ne evîna îlahî û îdeal e, ya beşerî ye. Evîn, temaya bingeşîn e, temayên wekî xerîbî û mirînê jî di nav risteyên heyranokan de cî digirin. Mijarên wekî hezkirin, bêrîkirin, xerîbî, êş û kulên ji ber eşq û firqetê, gîlî û gazind û hwd. jî bi awayekî bi evînê re têkilîdar derdikevin pêşberî me. Her wiha heyranok ji hêla hêma, motîf û sembolan ve jî gelekî dewlemend in.

Motîfên wekî cilûbergên berê; xizêm, hesp, şivan û pale herî zêde hatine bikaranîn. Dîsa sembolên wekî çûna leşkeriyê, tirên, xweşî, hîv û çûna ser kaniyê di nav risteyên heyranokan de zêde zêde cî digirin. Her wiha di heyranokan de ji bilî temayan gelek mijar û hêma yên wekî; nîfir, siruşt, erdnîgarî, xwezî, erotîzm, çînen civakê, flora, faûna, sond, dijûn, pesin, navê şexsan û hwd. derdikevin pêş.

7. ÇAVKANÎ

Çavkaniyên Nivîskî

- Alakom, R. (2009). *Di Folklorê Kurdî de Serdestiyeke Jinan*. İstanbul: Weşanxaneya Avesta.
- Amîdî, R. (2010). *Heyranokê Kurdî*. Hewlêr: Weşanxaneya Spîrez.
- Amîdî, S. B. (2013). *Folklorê Kurdî*. Ziya Avci (t.g.z.). Ankara: Weşanxaneya Lîs.
- Artun, E. (2012). *Türk Halk Edebiyatına Giriş*. Adana: Karahan Kitabevi.
- Cigerxwîn. (1988). *Folklorê Kurdî*. Stockholm: Weşanxaneya Roja Nû.
- Cindî, H. û Evdal, E. (2008). *Folklorê Kurmanca*. İstanbul: Weşanxaneya Avesta.
- Dorson, R. (2016). *Folklor û Teoriyên Folklorê Yê Îroyîn*. Necat Keskin (wer.). İstanbul: Weşanxaneya Avesta.
- Özarslan, M. (2006). *Ferhat ile Şirin Mukayeseli Bir Araştırma*. İstanbul: Doğu Kütüphanesi.
- Sadinî, M. X. (2011). *Heyranokên Kurmancî*. İstanbul: Weşanxaneya Nûbihar.
- URL-1, <https://sozluk.gov.tr/> (Dîroka Gihîştinê; 09.01.2011).
- Yıldırımçakar, M. (2017a). *Heyranok di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de Mînaka Herêma Wanê*. Muş: Zanîngeha Muş Alparslanê. Enstîtûya Zanistên Civakî. Teza Masterê.
- Yıldırımçakar, M. (2017b). "Heyranok ji Hêla Ziman, Şêwaz û Naverokê ve: Nimûneya Herêma Wanê". *Nûbihar Akademi*, 2 (7), 79-91.

Çavkaniyên Devkî

- Çalış, Asuman. (Nexwenda) 20ê Gulana 2013an, Mijara Hevpeyvînê "Berhevkariya Heyranokan", Wan/Qelqelî.
- Koşmaz, Kıbrıs. (Nexwenda) 14ê Gulana 2013an, Mijara Hevpeyvînê "Berhevkariya Heyranokan", Wan/Qelqelî.
- Özbek, Nariç. (Nexwenda) 22yê Pûşpera 2013an, Mijara Hevpeyvînê "Berhevkariya Heyranokan", Wan/Xoşeb.

- Özbek, Nurettin. (Nexwenda) 22yê Pûşpera 2013an, Mijara Hevpeyvînê “*Berhevkariya Heyranokan*”, Wan/Payizava.
- Sayin, Hangül. (Nexwenda) 8ê Avrêla 2015an, Mijara Hevpeyvînê “*Berhevkariya Heyranokan*”, Wan/Bêgirî.
- Sezer, Muhsine. (Nexwenda) 25 Pûşpera 2016an, Mijara Hevpeyvînê “*Berhevkariya Heyranokan*”, Wan/Miks.
- Yıldırım, Şadya. (Nexwenda) 19ê Gulana 2013an, Mijara Hevpeyvînê “*Berhevkariya Heyranokan*”, Wan/Qelqelî.
- Yıldırımçakar, Bala. (Dibistana Seretayî) 18ê Gulana 2013an, Mijara Hevpeyvînê “*Berhevkariya Heyranokan*”, Wan/Qelqelî.
- Yıldırımçakar, Hüsnâ. (Nexwenda) 18ê Gulana 2013an, Mijara Hevpeyvînê “*Berhevkariya Heyranokan*”, Wan/Qelqelî.

Extended Abstract

Folklore is the knowledge about folk, also the science which deals with “the knowledge of folk”. Folk poetry is a sub-section of folk literature and heyranok is included in it as a genregj. “Heyranok” is one of the genres of Kurdish folk literature. Among the genres of Kurdish folk literature, *heyranoks* deserve much research and analysis for their inherent characteristics. Our work focuses on the content of the *heyranoks* collected in the Van region and tries to identify and analyze the subjects, themes, images, motifs and symbols of these *heyranoks*.

We wrote about content elements in the beginning. Then, the *heyranoks* were analyzed by the content in a scientific context, according to the ways and means of the science of culture, folklore and literature.

A literary work consists of two main elements; form and content. The form of expression is the style of expression, its content also means the text or product. The topic is the basis of all the writing and speech about which it is spoken and written.

The theme is the basic motif of the work. Feelings and ideas are at the heart of the art work. The value of the work does not depend on the topic but on the theme. The theme is orderly, if enriched with proper data the value of the product increases.

Love is the most widely discussed subject in folk literature. This literature is based on love, the relationship between a man and a woman, separation, poverty, homesickness. Love, romance and things related to love become the subject of heyranoks. The basic theme in heyranok is love. The theme of love is also a basic theme in classical literature and this love is the ideal divine love, but in folk literature especially in heyranok love for a person has been used.

Themes such as strangeness, love and affection are also often used in *heyra-*

noks. The theme of homesickness occupies an important place in the *heyranoks*. There is also a death theme in the *heyranoks*. Death is a symbol of not reaching each other. Death is better than separation.

Motif is an element, an idea that is often repeated in works of art and strengthens the theme. A symbol is also an object that represents something else or is used without it; usually represents something deeper and more important as an emblem or a sign. The most striking element is the symbol that separates the language of poetry from the daily language. Most of the depictions are made in the poet's imaginary world. They are out of the ordinary and need to be genuine.

The beauty and beauty of nature is also mentioned in many places in *heyranoks*, along with the love and affection of nature, the nature also comes to the fore. The principles of nature with their positive and negative sides help and play a key role in providing love, homesickness, affection and longing.

Content elements are subjects, themes, and meanings, as well as images, motifs, and symbols. As a result, it was found that the subject of *heyranoks* were love and affection. The main theme that emerges in the content of the *heyranoks* is love and themes such as homesickness and death are also included in them. *Heyranok* is also very rich in images, motifs and symbols.